

Wargehên Bêdawiyê: Sergeranbûna Mêjû û Fantaziya Dilawer Meyqerî

(2- 2)



Wergêrana: Besam Mistefa

B-Dem

Di romanê de, mijada “alternatîv” girêdayî cih û cêwiyê demê ye. Di seridandinê de dema niho heye û dema bibîrxistî ya ku qala şoreşê bi rastî û fantastîk jî dike. Babeta dem ê rengê xwe yê dîrokî wernagire ji bilî di riya ezmûna mirovî ya zindî de. Biyanî -wekû mînak- bi hûrdema katî hest dibin ji ber ku ew reng û çarenivîsên mirovî bi xwe werdigirin. Ev realita niho, ya bi fantaziya re têkelbûyî ye bi amadebûneke din ya nehênî û ji nişkê ve: rabûna miriyên mala “Moza” di hûrdema seridandinê ya niho de, dihê xerqkirin. Piştî vê rabûnê -rabûna miriyan- demeke buhurî dihê bibîrxistin, ango çaxê kujtina wan li ser destê Firensiyan û vegevandina rewş û bardûdoxên şoreşa niştimanî dijî wan dagîrkerên biyanî. Diyar e ku çarçoveya dema romanê, tenê li gor babeta fantastîk a “alternatîv” hatiye destnîşankirin, jixwe berê jî me gotibû ku çarçoveya behskirî ji despêka dema 6 salên ku li pey kujtina endamên binemala “Moza” dihên û dût re guherîna bo sîberên nediyar ko tenê ji layê biyanî û sîberekî din (“Seîd Axa” lîderê şoreşê)ve dihên dîtin. Biyanî di riya diyalogeke buhurî

naveroka erka xwe dubare dikin sebare bi “afirînerê agirîn” mîna dubarekirineke yekrengî ji tiştê ku di 6 salan de qewimiye: “ku ji semyanên afirandinê di pileya wê ya şeşemîn de ne” (r.150). Lê, tevî heyamên “Wargehên Bêdawayê” yên mêtafîzîk pirsê demê dimîne pirseke objektîv ne şayisek ji ber ku dem weke ku rexne dide zanîn unsurekî diramatîk e di warê liv û tevgera bûyer û kesayetîyan de di çarçoveya bîrewerî yan jî hişemendiya takekesane de û di jiyana derûnî ya hundirîn ya lehengên berhemên wêjeyê de.

Weke me berê jî anîbû zimên, di xeleka yekemîn ya vê gotara di nav destê we de, pîrsgirêka dîrokî li nik Selîm Berekat bi giştî ne rewşeke durû an jî zêdeye di tevna cîhana wî ya romanê de. Di “Wargehên Bêdawayê” de, tevî jîngehên wê yên fantastîk û zimanê wê yê neşkere û zehmet, seridandina wê bi pisporîyeke hunerîya balkêş hatiye rapêçandin ango bi rûdana wê ya herî berz ku ew jî şoreşa “Amûdê” ye ya ku li seranserê herêma Kurdî belavbû. Aktîvetiya seridandinê, di biwarê pesinkirina rûdana gotî de, bala xwêneran dikşîne û wan neçar dihêle ku romanê ji serî heta binî bixwînin. Wisa, karûbarên şoreşê berdewam dibin dûv re bi têkçûna serokê wê “Seîd Axa” û bazdana wî ve bi dawî dibe: dema pêşîn di realetê de li vê derê dihê vegerandin wexta ku bala xwe dide karûbarên jinên malê (zaroka keç “Hîba”, diya wê û xaltîkên wê) û di fantazyê de dema ku çavdêriya biyaniyan û erka wan ya nehênî dike, ev biyaniyên ku bi awirên xayîz yên sîberên miriyên mala “Moza” ve têne ezmûnkirin. Beşê 5-ê û yê dawîn yê romanê jî tenê çarçoveya hevgihanê ya tavilê dem û çaxên romanê ye; yên realist û mêtafîzîk û dîrokî: biyanî di dawî de dişin “afirînerê agirîn” ji veşargeha wî derêxin û li gel de berev deverê nediya ve bi rê dikevin. Hevdîtînen sîberên binemala “Moza” yên mirî bi “Seîd Axa” serokê şoreşê yaxud bi sîberê wî re -seridandin her dem wî nehênî û nediya pêşkêş dike dubare dibin. Seridandina ku bi vegera jinên mala “Moza” berev karûbarên xwe yên rojane û bêcir re tewaw dibe heta hûrdema daketina balafira ecêb ya ku gir bi tevahî ji aramiya wê ya xuyayî şiyar dike. Dem, di wê kata

qeyranbûyî de, mîna ku: “ew valahiya haydar mîna dilekî raketî ku dê li ser tirsekê rabe” (99) dixuye.

C-Kesayetiye (Karakterên) Romanê:

Di dawî de, niyaza “alternatîv”ê ya behskirî di riya gelek hevsengan de li ser asta kesayetiye romana “Wargehên Bêdawiyê” de, eşkere dibe; tiştê ku hatibû tekezirin li ser astên dem û cih jî. Berî hertiştî, niyaza gotî bi vê hevsenga hanê re lihevtê: amadebûna mirovî û dijberê wî, amadebûna nemirovî ji teba û giya û nelivbaran. Li vê derê pêwîst e bihê zimên ku wêjeya Selîm Berekat yê ku cîhanke taybet bi şewaza xwe ya fantastîk avakiriye di riya zimanekî helbestane de bi rîtima wê ya hunerî û wêneyên wê yên sax û zindî yên bi tundî girêdayî xwezayê ve. Di “Wargehên Bêdawiyê” de, nivîser piraniya diyardeyên xuristî û jîndar û heyînan bi hest û derd dike û digihîne me. Jixwe, dahênaniya nivîserê me nexasime di vî warî de, li nik xwêner hestên piştgirtina wan “tiştên” behskirî tevî ku di nêzîkahiyeke tinazger de an jî destnîşankirineke bêdeng de di nav bûyerên jiyana rojane ya rotînî de, jê re hatine pêşkêşkirin. Dîsan, ev roman çendîtiyeke têr ji kitekitên ku mîna “karûbarên tebayî” tîne nasandin pêşkêş dike; ew xwênerê xwe jinişkêve di despêka rûpela xwe ya yekemîn mîna tomarkirineke pênasikirina lehengên wê re, ku dihê de di nav gelek tiştan de navên lawir û firendeyan heye eynî weke navên kesayetiye mirovî, jixwe berê jî me tekez kiribû ku tîma (hizra) “alterantîv” tenê ji xeyal û fantaziya nivîser hatiye, lê her weha ew girêdayî kokên wî yên gundî ye dema ku di bîranîna xwe de wan di riyên wêneyên mendehoş tevî hemî reng û semiyên û şîyanên wê ve tîne zimên, weke dema ku nivîser destnîşan dike hatiye di wan emrazên balafirgehê de yên firiyayî: “wek ku xweda wan jenadin dijene weke heriya bi jenekê ve ku di navbera zemîn û qiyametê de asê maye” (r. 139).

Bi kurtî, dema ku nivîser di vê romanê de ewleyî bi hizra “alternatîv” tîne, ew wisa heyamên xwe yên fantazîk bicî tîne ji aliyekî ve û ji aliyê din semolisma xwe bileş dike. sebareti bi

lehengên romanê yên realist û ta ku yên efsanewî tiştê ku em dê wan lehengan di hevsengeke din de bînin zimên, hevsenga ku du wateyan bi xwe digire: hatina biyaniyên Firensî beramberî biyaniyên efsanewî, û amadebûna keçên “Moza” eramberî amadebûna sîberên miriyên merivên wan. Li gor peresenga gotî, nivîser me berev bakgraunda demî û dîrokî ya romanê ve vedigerîne. Mebesta me ew e li vê derê şerê di navbera herême li dijî biyaniyên Firensî. Hîn 6 salan di ser şoreşa ku Mûsa Moza tê de jiyana xwe ji dest da li ser destê wan dagîrkeran derbas nabin ta ku keçên wî tûşî rasthatîneke jinişkave dihên dema ku 4 biyanî dihên û yek ji wan rûnuxumandî ye, ji vê bûyerê fantziya ku hewil dide rûdana dîroka ku her û her giyanê xwe li ser seridandinê ferz dike, vegerîne, destpê dike. Her çar biyanî heye ku sembola her çar parçeyên welatê kurdan, kurdistan bin, û rastiya amadebûna fantazîk ya her çar kesên ku têne berev gir ve beramberê amadebûna rastiyanê ya dagîrkerên biyanî (firensî) weke ku ew alternatîv be jê re. Erka her çar kesan a ecêb angu derxistina “afirînerê agirîn” ji veşargeha wî û rizgarkirina wî ji êxsîrtiya wî, ew jî semboleke ji xwestina gir ku ji dagîriyê rizgar bibe, tevî ku nivîser vî tiştî di riya sîber û jîndarên efsanewî re pêktîne. Belê, pîrsa ku dimîne ew e: gelo çi ne ew simbolên ku nivîskar dide “afirînerên agirîn”?

Belê me got ku ew kesên biyan di wê erka ku ji bo wê hatibûn biserketin û karibûn ku wî afirînerê efsanewî rizgar bikin û ew kesê ku rûnuxumandî bû bi wan re radihêje tiştûmiştên wan û mîna “seg” dihê binavkirin, li vê derê cara yekemîn rûyê xwe eşkere dike dema ku afirînerê navbirî ji veşargeha xwe derdikeve: “her du bi heman semyanan bûn” (r. 213). “Seg” barên xwe dide hevserê xwe “afirînerê agirîn” û her du dest pê dikin bi wan biyaniyan re berev cihekî nediyar ve diçin. Babeta “Hevser” di wêjê de, diyardeyeke eşkere ye dişibê alternatîv wekû jêder û bêje jî û me ji despêka vê lêkolîna xwe de anîbû zimên. Hate xuyakirin ku ew “seg” dişibê “afirînerê agirîn” ji aliyê form û kar an jî tevgerê ve, dema ku radihêje barê wî yê hesinî ku ew kesê rûnuxumandî ku bi wan biyaniyan

re hatibû û ew ê ku timî bêdeng heta ku hevserê wî ji veşargeha xwe derdikeve. ya ku li gor dîtina me vedigere erka biyaniyan ya gotî, dihê xuyakirin ku ev bar ê giran sembola zordarî û derdeseriyane a ku xelkê gir yên bindest di bin de mane, lê sebareti afirînerê agirîn û seg ê ku dişibiyê de dihê zanîn ji nîşanên seridandinê ku ew sembola firiştê serkêş ê ku ji bavê me Adem re liçok nebû ye dema ku bi serbilindî got: “ ez ji agir im û ew ji heriyeyê ye “ , ji ber vê çendê ku laneta olên asîmanî bi ser de hat. Berevajî vê ku ew di ola Êzîdiya Kurdî de hate pîroz kirin e wekû xwedayekî bisaw di rengê balindeyekî xweşik de bi navê “ Melekê Tawûs “ daniştîyê herdemî di nav tariyê û tîrbûnê de.

Naxwe, vane sîberên binemala “Mozan” aliyê din yê peresenga behskirî pêk tînin, angu amdebûna wan ya efsanewî a berevajî amadebûna keçên “Mozan” ya realist a ku armanca wê dem a buhurî bîne mîna veğerandina rûdaneke dîrokiya giring di jiyana xelkên gir de angu şoreşa li dij Firensiyên ku me berî destnîşana kiribû û bandora xwe li ser jinên binemala “Mozan” di dema niho de ji ber ku şoreşê jiyana hindê endamên malbata wan bir, yek ji wan “Mûsa” di seridandinê de dihê behskirin wekû sîberekî tevî sîberên jin û zavayê wî. Ji bo bicihanîna erk a ku girtibûn milê xwe dema ku sax bûn: angu avakirineke tunela avê ji robar berev wê veşargeha ku “afirînerê agirîn” dihê de bû. Evê ku her dem di xeyala millî ya rûniştevanên gir de. Di jînenîgariya Selîm Berekat a şexsî de nîşanek heye ku baweriya me dûpat dikewekû libendemana Godo ew jînenîgariya me dihê de xwend ku dîsa basa afirînerê efsanewî dike wekî amadebûna firênerê me di romana di nav destê me de: “em ji xwe dispîrin gelo Mîro mir? “ew vedigerînin” na!ew tevî keriyê xwe yê ji beranên şeytanî li ber rojavayekê bi rê ket. “Bi soza ku ew qadê dagîr bike û çû berev hêla ku herdem tarî dimîne” (r.7)ew wêneyên fantazîk, yên behskirî, di deqê romanê de dê tunebûna eger ku ne bi “realistî” bûma di wijdan an jî derûna kesayetiyên romanê de. Di benda “mîro” /an jî “ afirînerê agirîn de bi daxwaziya peydekirina utopiyaya kurtalker de gir dê mercedar bimîne ji ber

egerên nakokiya neteweyî û civakî. Ev nakokî, di despêka her beşekî ji romanê, di pevçûna herdû keleşêran “Reş” û “Belek” Xwênerên romana “Wargehên Bêdawayê” li wan temaşe dikin çawa her yek ji wan dixwaze gir bi dest bixe. Lê, ew nakokî, di despêka her beşekî ji romanê de, bêtir mîna tevdanekê ne pevçûneke gur dixuye. Ta ku pevçûna her du keleşêran xwîndar bibe, rûpelên dawîn yên seridandinê ku “afirînerê agirîn î ji veşargeha xwe dihê derêxistin” û “Seîd Axa” carek din dixuye û paşê daketina balafirê li ser zemîna deşta li rex gir. Reqereqa balafirê tevlî qêrînên “Çaçan” yê ku pir dirêj nake ku ew ji hiş diçe ji ber dîtina balafira ku dîdara zevî û avê -ku bi hewesa xwe ya nexweş xwe pêwanê wan dijmêre: vedigire dibe: dîdareke heta dawî trajîdîk e di sembolisam xwe de ku hatina şaristaniya rojavayî berev herêmê ve û herifandina giyanê mirovê deverê yê bindest destnîşan dike.

Têbînî:

- 1-Şuyîb Helîfî, Poetîzima Romana Fantastîk-Kovara “ Kermel ” a ku li Qibirsê derçûyî, hijmara 40/41 ya sala 1991, R. 116.
- 2-Kazim Cîhad, “Wargehên Bêdawayê” ya Selîm Berekat - Kovara “Kermel”, hijmar 48/49 ya sala 1993, R.330
- 3-Rolan Bart, Ezmûnkirina Simiyoljiya/wergera Erebi li Dar Beydaa(Mexreb)1986, R. 40
- 4-Selîm Berekat, Wargehên Bêdawayê -Çapa Êkê li Bêrûtê1993: tevahiya wergirtinên vekolîna me ji vê pirtûkê hatine girtin.
- 5-Hemanjêder.
- 6-Rolan Bart, Rexne û Rastî-Çapa Erebi li Helebê1994, R.84
- 7-Selîm Berekat, Jînenîgariya Xortaniyê-Bêrût 1982. R.19

Sirinc:

Ev vekolîna rexneyî, di sala 1993 an de, di rojnameya “ Heyat ” a Lundonî de hatiye weşandin û noke ez wê careke din li gel hindêk serrastkirinan diweşînim. (Nivîskar)

*Jêder:www.amude.net